# Namek ji Hundirê

Zeki

**Zeki Bayhan**

**KURTEYA NAVEROKÊ**

Nameya Zekî Bayhan ji zindanan.

**PEYVEN SEREKÊ**

*Girtîyên siyasî, tecrît, girtina xûrê, name, jiyana rojane*

New articles in this journal are licensed under a Creative Commons Attribution 4.0 United States License.

This journal is published by Pitt Open Library Publishing.

## NAMEK JI HUNDIRÊ: ZEKİ

Slav,

Em hezkirin û hurmeta xwe pêşkêşî her kesî dikin û hesasiyeta we ya ji bo çareserkirina pirsgirêkeke civakî ya wek tecrîda di bin rejîma siyasî ya zordar de ku welat veguherandiye girtîgeheke mezin silav dikin. Ez dizanim ku hûn jî ne azad in û ditirsim ku hesasiyetên we yên li hember tecrîdê wiha berdewam bikin, tecrîda we jî dê kûrtir bibe. Ma ne wisa ye, îro her kesê ku ne alîgirê hikûmetê be, dibe ku her kêliyê bikeve girtîgehê. Hevalekî ciwan ê ku beriya çend salan hatibû girtin, piştî bi dehan hevalan bi hev re dirûşme qîriyan, got, "Ax ez li vir azadtir im, ger min li derve van dirûşmeyan bikira ez ê bihatama girtin."

Ez meraq dikim ku têgeha tecrîdê di têgihîştina mirovên li derve de çi têgînan çêdike. Dema ku ji min hat xwestin ku ez di derbarê tecrîdê de tiştek binivîsim, yekem tiştê ku hat bîra min ew bû ku, "ma ez karim çi bêjim..." Ne ji ber ku tiştek ku ez bêjim tune ye, berovajî ewqas pir tişt û encamên wê ya wêranker... Hene, lê mirov nizane kîjan û çawa şirove bike. Û gumana tiştên ku bêne gotin dê çiqas werin fam kirin jî ji mejiyê mirov dernakeve . Ji ber ku tecrîd û pêkanînên tecrîdê dema ku bi kûrahî were nirxandin ew qas dijmirovane ye ku li derveyî têgihiştin û tecrubeya mirovan dimîne. Ji ber vê yekê, ev qet ne hêsan e ku bê fêm kirin.

Ji ber vê yekê ye ez wisa hîs dikim ku wekî ez ji pencereyek dûr bangî we dikim. Tecrîd di rastiya xwe de tê wateya bê pencerebûn. Di tecrîdê de, hemî pencere li hundur ve dinêrin. Ev cureyekî tehrîbkirina xwe bi xwe ye. Îşkenceyeke xedar e ku meriv li her derê ku meriv lê binêre bi zorê meriv tenê xwe bibîne, xwe bibihîze û xwe hîs bike. Meriv wisa hîs dike ku meriv di avgerê de tê girtin û ber bi binî ve tê kişandin, hûr hûrî dibe, diherike nav xwe û bi ser xwe de dihele.

Erê, pencereyên tecrîdê ku li derve dinihêrin tune ne, lê mirovên ku li ber xwe didin di dîwarên tecrîdê de qulên piçûk çêdikin. Hûn dizanin, dema ku mirov rûyê xwe dide ber qulek piçûk û lê dinêre, ew qul mezin dibe û dibe pencereyek. Ji ber vê yekê ez ê hewl bidim ku çend pencereyan vekim da ku hûn hundurê tecrîdê bibînin. Ez dizanim ji ronahiya derve dîtina tarîtiya hundir zehmet e, lê ger meriv ji paceyan nêzîktir binihêre, belkî piçekî jî... Ka em bên mijara pencereyan ...

### Pencereya 1.

Tecrîd îzolekirina fizîkî ya mirov a di navbera çar dîwaran de ye. Bi giştî di vê çarçoveyê de tê analîzkirin, rexnekirin û her wekî din. Lê belê, ev tenê aliyê bûyerî ya tecrîdê ye. Mekan-mîmarî qada pêkanîna tecrîdê ye, ne tecrîd bi xwe ye.

Tecrîd di rastîyê de ne pratîkek e ku mirov tenê di nav çar dîwaran de dihêle. Armanca tecrîdê ew e ku hişê mirov di bedena xwe de heps bike. Tiştê wêranker, tiştê tehrîbkar ev e. Armanca îzolekirina fizîkî, kontrol û şopandina teknolojîk ya pergala girtîgehê ev e. Bi tecrîdê re hemû bal, hesasiyet, fikar û tirsên girtiyan ber bi xwe û bedena xwe ve diçe. Dema ku girtî dikeve vê xefikê, dest bi kolandina xwe dike û xwe bi xwe dixwe. Tecrîd polîtîkayeke ku mirov, xwe, bi destên xwe ber bi tunekirinê ve kaş dike. Çi fîzîkî, çi îdeolojîk, çi polîtîk, çi manewî, lê illeh wêranbûn...

### Pencereya 2.

Ji yên herî tarî heta bi hemû halên şolî, armanca tecrîdê yek e; rûxandina mirov di aliyê derûnî , hestiyarî û rewşenbîrî yê.
Bê guman, di şert û mercên tecrîdê de ku meriv bi tenê an bi yek an du kesên cûda re bimîne ferq dike. Ji bilî denge xwe bihîstina dengekî din rehet e, lê mirovên ku di nava şert û mercên îzolasyonê de bi hev re dimînin bi demê re hêdî hêdî zindîbûn û cihêtiya xwe ya ji bo hev winda dikin. Bihevrebûna domdar ya di cihekî çend metre dibe sedem ku mirov bi demê re her tevger û refleksa hev ji ber bikin. Û yên ku bi hev re dimînin, heta radeya ku cudahiyên xwe ji bo hev winda dikin, dibin beşek ji pergala tecrîdê. Tecrîda yek kesî vediguhere tecrîda sê kesî. Û carinan tecrîda ji bo sê kesî hîn dijwartir dibe.

### Pencereya 3.

Tecrîd îmhayeke sîstematîk e ku tê de mirov hem bi mirovatî û hem jî bi bêmirovatî têne cezakirin. Tecrîda yek kesî mirovan bi tenêtiyê ceza dike. Hûn bi dilşewat dixwazin dengek cûda bibihîzin. Li aliyê din, di tecrîda sê-pênc kesî de, hûn bi mirovan re tên cezakirin. Nizanim ka hûn dikarin fêm bikin ka ew çi ezabek xedar e ku di tenetiyeke bi salan lê dîsa jî hûn nikarin yek kêliyek xwe bi xwe bimînin.

Ez behsa rewşên mîna gava ku hûn aciz in nikaribin bimeşin herin , dema ku hûn nerihet dibin nekarin biçin odeyekê û derî li pişt xwe bigirin, gava ku hûn ji êşê diperpitin û nekarin quncikek bi aram bibînin û bêhna xwe vedin..

### Pencereya 4.

Di tecrîdê de jiyan, dubarekirinek bêdawî ye. Her roj wek her rojên din e. Bifikirin ku deh, bîst sal, sî sal hûn di heman rojê de dijîn. Hûn hîs dikin ku hûn di wextê de daliqandî mane; Hûn hîs dikin ku têgihîştina we ya demê ji holê hatiye rakirin.

Ceribandineke biçûk a civakî; Ji yekî ku salekê leşkeriyê kiriye an jî li zanîngehê xwendiye, bîranînên wan bipirsin , ew ê ji we re dûr û dirêj qal bikin. Û Ji yekî ku bîst-sî sal e di girtîgehê de maye bipirsin... Ew ê ji qalkirinê bêtir bêdeng bimîne. Ji ber ku 20- 30 sal heman rojê ceribandiye.

### Pencereya 5.

Jiyanek tenê li ser dûbarekirina bêdawî dibe sedem ku bi demê re çalakiya ramanê êdî cihê xwe dide adet û e'limandinan. Jiyana her dem di heman rojê de ji nû ve fikirandinê bêfeyde dike. Adet û e'limandin jî ji hizirkirinê tên. Lê hiş carekê fikirî û misoger kir ku dê çi û çawa bibe. Êdî ew dubarekirina bêsînor e.
Di tecrîdê de, adet û e'limandin heya radeyekê jiyanê ewqas mekanîze dikin ku mirov bi gelemperî bêyî ku bifikire wiya dike. Carinan pirsek dikeve aqilê mirov "Ez meraq dikim gelo min ev tişt kir?" Tu li xwe dizivire û dibîne ku , te kiriye. Bê bifikirin...
Mirovên di girtîgehê de pir difikirin xuya dike. Lêbelê, di rastiyê de ev bi gelemperî ne ramanek analîtîk e. Ev di rewşeke piçek melenkolik de çûn û hatina di nav perçeyên perçebûyî de ye.
Min gotibû tecrîd hişê mirov di laşê wî de heps dike . Tora ku hiş tê de girtî ye jî adet û e'limandin e.

### Pencereya 6.

Di warê pratîkên takekesî de mirov li ser tecrîdê bifikire xapandin e. Tecrîd pergalek e, komek pêkanînan e. Pratîkên takekesî jî di vê çarçoveyê de wateya xwe dibînin. Ji ber vê yekê têgihîştina girtiyan a li ser pratîkan û têgihîştina yekî ji derve dinêre dibe ku ne wek hev be. Bi piranî jî ne wek hev e.

Bo nimûne; Hejmartin rojê du caran, her roj têne jimartin . Girtî têne jimartin. Ger hûn ji dewletê bipirsin dê bibêjin “ji ber ewlehiyê divê ez bijmêrim”. Ger hûn ji kesên li derve bipirsin, ew ê bibêjin, "Ev tê fêm kirin, zirarê nade."
Di têgihîştina girtiyan de, jimartin ew e ku rojê du caran tê bîra wî ku ew saxlem e, hişyariya wî ya tuneyî zindî dihêle.

Niha em bifikirin; Têgihîştina kesê li derve ya vê pêkanînê nêzîkî dewletê ye yan nêzîkî kesê di tecrîdê de ye;
Her weha ez dixwazim bînim ber çavê we ku jimartinek fizîkî çi qas bi ewlehiyê ve girêdayî ye da ku diyar bike ka girtiyên ku 24 saetên rojê di bin çavdêrî û şopandina her cûre amûrên teknolojîk de ne.

## Pencereya 7.

Tecrîd psîkolojiya gardiyanan jî xirab dike. Ne mimkûn e ku failên kiryarên dijmirovane normal bimînin. Mirov gav bi gav dibin cerdevan. Pergal jî vê yekê dizane. Ji ber vê yekê gardiyanên ku bi parêzer û malbatan re mijûl dibin û gardiyanên li hundir bi girtiyan re mijûl dibin bi gelemperî ji hev cuda ne. Rûyekî girtîgehê heye ku li hundur dinêre û rûyekî jî yê li derve dinêre.

Ev pencere ne pencereyên ku ronahiyê tînin, ev pencereyên ku tariyê tînin derve ne. Ji ber vê yeke dibe ku ev qas tiştên min qal kir we tengezar kiribe. Halbûkî min nû dest pê kiribû, lê ez ê li vir temam bikim.

Di dawiyê de dixwazim bi çend tiştan li ser aliyê din ê meselê bibêjim. Erê, tecrîd reşî tarî ye. Ew, mirovan bi torên bêhejmar dorpêç dikin. Hişmendiyek tunebûna bêdawî hêdî hêdî hiş, hest û her wekî din dorpêç dike.

Lê li gel van hemûyan jî berxwedan pêkan e. Li dijî tecrîdê berxwedan zehmet e, divê hûn ronahiya di tariyê de bigirin û mezin bikin. Girtiyên siyasî vê bi dest dixin. Berxwedan piralî ye. Mînak ji bo girtiyekî ku 10 an 20 sal in di tecrîtê de ye, li ser mijareke siyasî ya rojane gotarek çapkirî binivîsîne, li dijî tecrîdê karekî mezin e. Helbet naveroka ronakbîrî ya gotarê girîng e, lê ya girîngtir û bi qîmettir ew e ku tevî ku bi salan îzole bûye jî ji rojeva têkoşîna gel derneketiye û dikare behsa siyaseta heyî bike. Ev mînakek e nîşan dide ku ev tecrîd bi vîna mirov dikare were derbaskirin.

Girtiyên siyasî, çi di girtîgehê de çi jî di tecrîdê de, kirdeyên siyasî yên têkoşer in. Ji ber şert û mercên girtîgehê yan jî tecrîdê ji pozîsyona kirdeyê siyasî yê ku têdikoşe ber bi pozîsyona mexdûriyetê ve. Ji bo girtiyê siyasî xala ku rûxandin dest pê dike ev xal e. Ev xefik e. Mixabin hinek ji me hene ku dikevin vê xefikê. Dema girtiyên siyasî ji nasnameya xwe ya siyasî û têkoşîna xwe tên îzolekirin, ya ku dimîne mirovahiya mexdûr e. Armanca rejîma tecrîdê ev e.

Guhertina girtîgeh û pergala tecrîdê bi guhertina sîstema siyasî pêkan e. Ev têkoşîneke demdirêj e û ji ber vê yekê jî dem dixwaze. Ev tê vê wateyê ku tecrîd dê di demeke nêz de neyê rakirin. Wê çaxê, em dikarin li ser jiyana, berxwedana girtiyên siyasî yên di girtîgehê de tiştin bifikirin. Divê neyê jibîrkirin ku; Kesê di tecrîdê de herî zêde hewceyê mirovan e, û mijar ne mijara piştgiriya madî ye. Çend nimûneyên biçûk yan jî pêşniyar...

Yên ku tecrîda li girtîgehê bi rengekî herî giran dijîn , girtiyên siyasî ne ku cezayên giran ya muebet li wan hatiye birîn. Li girtîgeha ku ez tê de me 9 kes, li 3 girtîgehên kampusa me bi giştî derdora 20 kes hene. Ger her yek ji parêzerên welatparêz, şoreşger û demokrat ji van hevalan parêzgerê xwe bigire û tenê di nava 3 mehan de 1 saetekê hevdîtinek pêk bîne, dikare bêhnekê bide van hevalan.
Dîsa ger her yek ji kesên hestiyar ku ne parêzer in û nikarin bên hevdîtinê , bi yek ji van hevalan re bibin hevalê nameyê û her çend mehan carekê du pirtûk ji wan re bişînin, dê ji bo van hevalan bêhnek xweş be.

Ma têkiliyên weha ewqas dijwar in? Teqdîr ya we ye. Min pêşniyar kir. Divê em tecrîdê ji rewşa wê ya herî tarî bigirin û ji wir dest bi têkoşînê bikin. Em wê derê ji bîr nekin!

Dibe ku tecrîd sar be, lê ruhê berxwedanê germ e. Bi hezkirin û rêzdarî, bi germahiya berxwedêran we hemûyan silav dikim...

**Zeki Bayhan**
*Girtîgeha*